Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :975 | 29-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165

# Şênî ber bi şîna Şehîd Rûken Zelal ve herikîn

**Li Qamişloyê bi sedan kes ber bi şîna ku ji bo Şehîd Rûken Zelal hat danîn ve herikîn, berxwedana fedayî ya şehîd silav kirin.**

Meclîsa Malbatên Şehîdan a Amûdê ya Qamişlo, ji bo her du gerîlayên Hêzên Parastina Gel, şehîd Dilara Orper (Sara Tolhildan) û şehîd Emel Fermez Hisên (Rûken



Zelal) konê sersaxiyê vedan. Kon li gundê Belêqiyê yê Amûdê ya Qamişlo hate vedan.

Di 26'ê Îlonê de her du şehîdên bi navê Rûken û Sara li navçeya Mezîtlî ya Mersînê ji ber zextên ku li girtîgehan tên kirin, komkujî û êrîşên bi çekên kîmyewî yên li ser gerîla, li dijî dagirkeriya dewleta Tirk çalakiyek fedayî li dar xist.

Bi sedan şêniyên Qamişlo, endamên saziyên civaka sivîl, nûnerên Partiya Yekîtiya Demokratîk, Kongra Star û Meclîsa Leşkerî ya Amûdê berê xwe dan konê sersaxiyê. Beşdaran sersaxî ji malbata şehîd Rûken Zelal re xwestin.

Di konê sersaxiyê de wêneyên



Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wêneyên her du şehîdan, alên Meclîsa Malbatên Şehîdan, alên Partiya Yekîtiya Demokratîk û Hêzên Parastina Gel hebûn.

Di merasîmê de Hevseroka Komîteya Jinan a Meclîsa Malbatên Şehîdan a herêma Cizîrê Cewahir Osman axivî û pesnê rola her du şehîdan da. Cewahir Osman wiha got: "Keçên me îro guleyên xwe avêtin dilê dijmin û planên wan pûç kirin. Ev jî nîşan dide ku bê guman em ê bi ser bikevin û dijmin nikare zarokên me ji eniyên şer derxe."

Cewahir Osman bal kişand ser êş û azarên girtiyên di girtîgehên dewleta Tirk a dagirker de û wiha domand: "Dijmin di encama têkçûna xwe ya li çiyayên Kurdistanê de li dijî girtiyan hemû rê, rêbaz û polîtîkayên derexlaqî û dermirovî bi kar tîne."

Her wiha li ser navê Meclîsa Leşkerî ya Amûdê fermandar Berxwedan Amûdê wiha axivî: "Dengvedana Tevgera Azadiya Kurdistanê ya bi pêşengiya Rêber Abdullah Ocalan gihiştiye her aliyê cîhanê."

Berxwedan Amûdê wiha pêde çû: "Weke ku tê zanîn dewleta Tirk a dagirker ji destpêka Nîsana 2021'ê ve, bi hemû çekên xwe û çekên NATO'yê yên pêşketî, kîmyewî ku di navneteweyî de qedexe ne, êrîşî Herêmên Parastinê yên Medyayê li çiyayê Kurdistana azad dike. Ev êrîş ji bo jiholêrakirina Hêzên Parastina Gel tên kirin."

Berxwedan Amûdê di dawiya axaftina xwe de çalakiya fedayî ya her du şehîdan bi bîr xist û wiha got: "Ev çalakî bersiveke zelal e li dijî sûcên dewleta Tirk a dagirker û binpêkirinên wê yên li dijî gelê Kurd û girtiyên di girtîgehên wê de ye û ji bo şikandina tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan."

Piştî axaftinan nasnameya Şehîd Rûken Zelal hate xwendin û radestî malbatê kirin. *-ANF*

# Azadî bi bisk û keziyên Jînayê tê hûnandin

**412 hunermend, wêjevan û rewşenbîran bi gotina. "Jiyan û azadî, êdî bi biskên Jînayê tên hûnandin!" ji bo çalakiyên piştî qetilkirina Jîna Mehsa Amînî, daxuyaniya piştgiriyê da.**

412 kesên ku di nav wan de hunermend, wêjevan û rewşenbîr jî hene, piştgiriya xwe ya ji bo protestoyên piştî Jîna Mahsa Amînî ya li Îranê, ji aliyê "polêsên hîcabê" ve di nezaretê de bi êşkenceyê hatibû şehîdkirin, nîşan da. Di daxuyaniyê de wan got, "Em bi ser bilindî, bi şanazî serhildan û berxwedana jinên berxwedêr silav dikin!"

**Ew ê dawiyê li tarîtiyê bînin**

Di daxuyaniya bi îmzeya hevpar a 412 kesan de hate gotin, "Li Rojhilatê Kurdistanê jina Kurd Jîna (Mehsa) Amînî bi hinceta ku serê wê bi hîcabê bi rêk û pêk



nehatiye nixumandin, hate qetilkirin. Li ser vê, xwepêşandan û serîrakirineke civakî, di serî de li Rojhilatê Kurdistanê bi pêşengtiya jinan û seranserê Îranê li hemû bajaran vegeriya raperîna jinan û gelan. Di vê serhildanê de heta niha bi dehan kes ji hêla rejîmê ve hatin qetilkirin.

Êdî jiyan û azadî bi bisk û keziyên Jînayê tên honandin! Azadî mafê bingehîn ê gerdûnî ye, jin û gelên ku îro li Rojhilatê Kurdistanê, li Îranê û cihanê hemûyî li ber xwe didin, ala azadiyê ya ku bi tayê porê xwe afirandine, bilind dikin. Em wekî hunermend, wêjevan û rewşenbîr baş dizanin ku jinên berxwedêr bi têkoşîna xwe dê dawîyê li tarîtîyê bînin. Em bi berxwedana jin û gelên birûmet serbilind in. Serketin wê ya berxwedêran be! Em bi we re ne! Jin Jiyan Azadî!"*-Ozgurpolitika*

# Metirsî li ser nîvê cûreyên dara palmiyeyê heye

**Li gorî lêkolîneke metirsiya tunebûnê li ser zêdeyî hezar cûreyên dara palmiyeyê heye.**

Zanyaran ji bo rîskên li ser gihayên bi darên dirêj rapelidikin heta bi darên palmiyeyê, hişê çêkirî bi kar anîn.

Daneyên hatin bidestxistin bi rengekî şênber nîşan dan ku metirsî li ser kîjan cûreyên dara palmiyeyê heye.

Palmiye ji malbateke nebatan a mezin e ku ji bo bi milyonan mirovî dibe xwarin, vexwarin û stargeh.

Ji Bexçeyên Botanîk ên Kew Qraliyetê ya Londonê Dr. Sîdonîe Bellot got, "Ji bo parastina cihêrengiya Biyo divê çi ji destê me bê em bikin. Niha metirsî li ser zêdeyî hezar cûreyên dara palmiyeyê heye."

Darên palmiyeyê li gel berhemên xwe yên gwîza hindistanê, rûnê xurmeyê û xurme, her wiha ji bo çêkirina mobîlya, rûn û ben jî têne bikaranîn.

Zanyar dibêjin, nebatên çolî ji bo gelên xxwecihî gelekî girîng



in. Lê belê beriya ku potansiyela xwe bê naskirin jî dibe ku ji holê bêne rakirin.

Li gorî daneyan, metirsiya tunebûnê li ser zêdeyî hezar cûreyî -zêdeyî ji sedî 50 ê palmiyeyan e- li ser dara palmiyeyê heye.

Lîderê heman lêkolînê Dr. Steven Bachman jî got, "Li gorî vê texmînê divê karên parastinê bibin karê sereke."

Tîman lêkolînê welatên Madagaskar, Gîne ya Nû, Fîlîpîn, Hawaîî, Borneo, Jamaîka, Vîetnam, Vanûatû, Kaledonya Nû û Sûlawesî weke herêmên destpêkê ku divê palmiye lê bêne parastin, diyar kir. Palmiye bi sedan cûreyên xwe yên beyanî yek ji nebatên herî girîng e ku ji aliyê aborî ve piştgiriya bi milyonan mirovî dike.

Li herêmên tropîk jî ji bo bi sedan civakan hem ji bo çêkirina mal û amûran têne bikaranîn hem jî dibin xwarin û derman.*-ANF*

Sudoku:Pirs 11

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 2 | | | 1 | | 6 | | |
| | 8 | | | | 2 | | | 7 |
| | | 6 | 9 | | 7 | | | |
| 5 | 7 | 9 | 2 | | | | | |
| | | 8 | 7 | 9 | 3 | 5 | | |
| | | | | | 8 | 7 | 9 | 4 |
| | | | 6 | | 5 | 1 | | |
| 2 | | | 8 | | | | 4 | |
| | | 5 | | 3 | | | 2 | |

Sudoku: Bersiv 10

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 5 | 9 | 4 | 1 | 8 | 2 | 3 | 7 |
| 8 | 7 | 3 | 2 | 6 | 5 | 1 | 9 | 4 |
| 1 | 4 | 2 | 9 | 7 | 3 | 6 | 5 | 8 |
| 5 | 8 | 4 | 7 | 2 | 9 | 3 | 6 | 1 |
| 2 | 9 | 6 | 3 | 4 | 1 | 7 | 8 | 5 |
| 3 | 1 | 7 | 5 | 8 | 6 | 9 | 4 | 2 |
| 7 | 2 | 5 | 6 | 3 | 4 | 8 | 1 | 9 |
| 9 | 6 | 1 | 8 | 5 | 2 | 4 | 7 | 3 |
| 4 | 3 | 8 | 1 | 9 | 7 | 5 | 2 | 6 |

## Jinên bajarê Qamişlo: Wê bi hezaran Zeyneb li dijî Tirkiyê rabin

Jinên bajarê Qamişlo dan zanîn ku Tirkiyê û hevkarên xwe çi bikin, nikaribin vîn û îradeya jina azad bişkênin û gotin, Eger Tirkiyê Zeyneb Saroxan û hevalên beriya wê kirin hedef, wê bi hezaran Zeyneb li dijî Tirkiyê rabin. *R-2*



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1001 | 1-otmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# `Wan serê jinan hemûyan bilin kirin û em çalekiya wan pîroz dikin`

Fermandariya Biryargeha YJA Starê got, Hevrêyên me Sara Goyî û Rûken Zelal bi sekna Zîlan di dilê dijmin de çalekiyek bi nirx û wêrek pêk anî û serê jinan hemûyan bilind kirin. Em vê çalakiya wan a bi heybet bi serbilindî silav dikin û pîroz dikin.*R-3*



Fermandariya bîryargeha YJAStar'ê di daxuyaniya xwe ya li ser çalekiya şehîd Ruken û Sara de got, li hemberî van zext û êrîşan, tevgera me ya azadiyê ku bi
çavkaniya Rêber Apo û peşengiya jinê hewl dide neteweya demokratîk ava bike, bi pîvana 'parastina hebûnê, misogerkirina azadiyê' têkoşîna rewa bi berxwedaneke gelekî bi heybet dimeşîne. Bi vê armancê li hemberî êrîşên herî qirêj ên serdemê, bi pêşengiya YJA Starê berxwedaneke mezin tê kirin, hêzên me tercîha jiyaneke bi rûmet datîne pêşiya her tiştî û veguherîne hêzeke bi bandor a lêdanê. Yên ku biryara xwe ya jiyanê li ser azadiyê dane, çalakiya wan jî, îradeya wan jî mezin e û têk naçe. Sekna gerîla bi kurtasî bi vî rengî ye. Çalakiya bi biryar û rêxistinbûyî ya bi heybet a hevalên Sara û Rûken ku beşek ji vê rastiyê ye, temsîla sekna jin a azad a bi afirîneriya Rêber Apo gihandiye asta bilind. Di nava van şert û mercan de ku komkujî li ser nirxên me tê ferzkirin, ev hevrêyên me bûn hêza lêdanê û pêkanînê ya tercîha jiyana azad, îrade û rûmetê.*R-3*



## Viyan Mayî: Sînema jî bi qasî xebata çekdarî xizmeta doza Kurd dike



Jina Sînemakar a Kurd Viyan Mayî behsa giringiya sînemayê kir û got, sînema jî bi qasî xebata çekdarî ji bo doza Kurd giringe. Mayî daxwaz ji hunermendên Kurd kir ku bi wijdanî kar bikin û got: "Her çiqas sînemaya Kurdî hinek belave ye, lê di heman demê de jî karek gelek ciwan heye û xebatek gelek baş di vî warî de tê kirin."*R-7*

## Hêzên Îranê 58 kes qetil kir û 270 birîndar kir



Hêzên Îranê li Zahîdanê êrîşê gel kir, jin û zarok jî di nav de 58 kes hatin qetilkirin.*R-3*

## Senteza Rêber Apo ya azadiyê bi ser dikeve



Idrîs Henan

Bi van raperînan careke din zelal dibe ku armanca hevpar, azadî ye. Peyamên van çend rojên dawîn, ji tevayî cîhanê re, isbat bû ku senteza Rêber APO ya azadiya jinê bi ser dikeve.

## Banga tevlîbûna girava giştî li xelkê rojhilatê Kurdistanê û Îranê hat kirin

*R-3*